**Erdal Öz/ Bavê Min Bû**

Gava dev û rûyê min, destê min di xwînê de mayî ez di deriyê hewşê re derbasî ser ferşikên devê derî bûm diya min selate çêdikir. Min zanî, bêhna xiyarên kesk kesk, nazik ku gava xwê li wan tê kirin av bi wan dikeve, di nav xiştêniya derbeyên kêrê de li dora devê dêrî belav bûbû. Ez neçûm hundir, ba diya xwe. Min xwe bi ser kevirê birî yê di ber deriyê camşikestî de berda. Dev û rûyê min bi xwîna zeliqonkî germ bû, werimî bû, tevzînok dihatinê. Ez di xwînê de mabûm û ji mehan nîsan bû. Roja li ber ava ku bi çavekî min dikarî bibînim, çi nemabû di pişt leylaqên tarî re winda bibe. Ji hêrsa xwe nedigiriyam.

Em li nav bexçeyê Kubî wan bûn. Berîkên min ji încasan pîpiqî bûn. Min çavnêriya Kubî dikir, yê li serê dara încasan a gir li keviya hewtê kevzgirtî ku dikir încasên tirş ên gir biweşîne. Kubî, her ku bêrik li guliyan dixist; tîrêjên tavê libo libo di nav nûpelên keks kesk re davêt ser û çavê min, wisa ez dirêjkirî. Hênikahiya giyayê di bin min de yê şil her ku digihîşt laşê min î xwêdandayî, wekî ku ji xewa şirîn ji ser çavê min here min Kubî didît, kêfa min jê re dihat: Ew Kubiyekî ku di hemû lîstikan de zora min dibir, hê wekî xweha wî pirzik di rûyê wî de nehatibûn, yekî zerik bû. Min guh nedida dengê zer yê wan încasên kesk ku diketin hewt, heta gava peşkên hûrik jî dipekandine min, hinekî jî , ez li bendê bûm ku nişkav încaseke hûrik bêje pit û devereke rûyê min a ku qet hêvî nakım. Bêrika Kubî pelên dirandî bi ser min de diweşandin. Pel difitilin ditilîn û li ser min didanîn. Lê rûyê min, ez mam li hêviyê, qene hebek încas tenê jî lê neket.

Berêvarkî, li ser ferşikên devê derî, di bin leylaqan de, li pêşber leylaqan dîsa bavê min di ber vexwarina araqa xwe ya hindik a îşê feqîran de, ez fikirîm kulmek încasên kesk bixim teyfika wî. Bavê min wê şaqiz mabûna. Belkî jî heyirî mabûna ji van  încasên ku ji kulîlkên spî zûzûka derbûne û heta mirov çavê xwe minç û bel bike wisa gir bûne. Wê rahişte yekê û bavêta devê xwe. Çawa jî çêbûya wê madê xwe tirş bikira. Lê nizanim, wê bikeniya yan na. Min çi qas dixwest bikeniya. Ez difikirîm gava bikene bêvila wî wê çawa mezin bibe. Lê bavê min qet nedikenî ku. Tim û dayîm bi wî çakêtê xwe yê pak û paqij, lê berstûk û zendikên wî qetiyayî, bi wî çakêtê ku jê dikişiya ji bîraya min ve lê bû, bi çavên xwe yên goştîn ên di pişt berçavkên xwe stûr û gilover de, bi rûyê xwe yê qermiçî, di êvara xwe de, di tarîtiya xwe de zilamekî weha sosret bû, seraqet diponijî, kî dizane li çi difikirî, wekî ku bi tenêtiya xwe dipesinî, çixare li ser çixarê dikişand, bavê min. Min qet fêm nekir çima di wê feqîrî û rebenî û xemsariya xwe de her êvar ew pêlava xwe ya qebîh, pozdayî û perçivî bi min dida biriqandin. Gava bavê min încasên ku min ji kulma xwe êxistin keviya penîrê wî yê di teyfikê de bi kirtekirt xwarin, ez ê biçûma ber ronahiya kwîr a li ber dêrî min ê ew pêlava wî ya qebîh a her car bibiriqanda. Her êvar min pêlava bavê xwe dibiriqand. Her êvar wî jî vedixwar. Şûşeyeke araqê ya li kaxeza rojnameyê pêçayî dixist bin çengê xwe, çavên xwe yên goştîn ên xwîngirtî, çavên kirh ên ku ancex

serê sibehan gava rûyê xwe dişûşt min didîtin, di pişt berçavkên xwe yên stûr de vedişartin, bi pêlava xwe ya wekî keviran deng derdixist, pêlava ji ber ku kevin nebe binikkirî ya qebîh û giran di devê deriyê hewşê re xuya dikir. Hê ew nehatî diya min sifre radixist. Heke zivistan bûya tirşî derdixist, havîn bûya selate çêdikir. Terîşek penîrê spî di avê de dima heta piça xwê tê nedima û her car di nîvê wê teyfika ferfûrî de bû. Carekê min tam kiribû, min qet ji wî penîrê kelê hez nekiribû. Lê bavê min wilo jê hez dikir. Bavê min pêlava xwe derdixist, şimika xwe ya kevnbûyî, mihayî, xwarbûyî dixist piyê xwe, diçû ber serê masa xwe, pîdavêt ser pî, şûşeya araqê serbejêr di nav paqên xwe de dişidand, desmala xwe ya mezin dikir taxe û di binê şûşê de diediland, bi kefa destê xwe lê dixist lê dixist heta mantara wê derdixist. Her cara bavê min lê dixist, wekî ku îskînî bi şûşê diket. Ez wisa li wir, wekî ku wê xerabiyek biqewime ditirsiyam, dimam. Lê tirsa min pêk nedihat.

Nizanim çima lê, bavê min qet nedipeyivî.

Dema wî vedixwar, ez diçûm min radihişt qotîka boyaxê, firçeyê û wî paçikê qedîfeyî, li ber ronahiya kwîr a ber derî pêlava wî boyax dikir, dibiriqand.

Em qet nedipeyivîn. Tiştekî xerîb e, em li malê qet pev re nedipeyîvîn. Em nedikenîn jî. Nizanim çima em wisa bûn. Belkî jî bavê min ji me hez nedikir, min pê dizanî. Bavê min ji tu tiştî hez nedikir. Wî ji xwe jî hez nedikir. Lê min dixwest ji încasan hez bike wê êvarê; min dixwest carekê bikene, biheyire jî dîsa bikene.

Tê bîra min, reşehiyeke mezin ji nişka ve mezin dû, hê min fêm nekirî mefer nedîtî xwe bilebitînim li pêleguha min ket, di ser çavê min î çepê re. Bêrik bû ya li serê min ketî, bêrika Kubî ya ku dadiweşand û ji destêwî filitî, bêrika mezin a kolana bexçe; destikê bêrikê bû yê li serê min ketî. Aliyê wê yê hesin li serê min biketa wê çi bibûya nizanim, lê tê bîra min çawa min destê xwe da serê xwe di xwîna boş a germ de ma. Ev jî tê bîra min ku Kubî ji serê darê xwe avêt xwarê û bi madekî zerbûyî li rûyê min î di xwînê de mayî dinihêrt û hûrik hûrik digirî. Çima ez li wir negirîm, çima min pêça xwe neda Kubî û guh neda girî û bergerîna wî, çima ez ji wir bi wê hêza xwe ya mayî reviyam çûm, nizanim.

Wextê diya min deriyê camşikestî vedikir û maseya darî ya piçûk derdixist ser ferşikan roj hê nû çûbû ava. Roj, hema di pişt leylaqan re çûbû ava. Qutikê min di xwînê de mabû û ji mehan nîsan bû. Gava min çavê xwe yê xwîn pê ve zeliqî lebitand û vekir ez têgihîştim ku ez ê kor nebim. Ax, min çawa xwestibû li wir kor bibim. Min dikarî biçim û xwîna li ser çavê xwe paqij bikim, lê ez neçûbûm. Devera birînbûyî di ser birûya min re bû; min ev ji mezinbûna goştê xwe û ji arîna canê xwe dizanî; lê min xwîn paqij nekiribû, min neşûştibû. Min xwestibû min wisa bi wî halî, di nav wê xwînê de bibînin, min xwîn di qutikê xwe jî dabû.

Diya min pêşî ez nedîtim. Ji ber ku ez nedîtim min dikir ji hêrsa xwe bifetisim, bikim borînî. Çavê wê tu kes nedidît ku, ji xeynî wî bavê min î mad û mirûzkirî. Çi hebûya her ji wî re bû. Bi salan rojekê jî dev ji amadekirina wê sifreya araqê ya her car bernedabû. Çend caran di ber min re hat û çû. Paşê ronahiya hundir pê xist; leylaq dîsa di ronahiyeke xemrî de xuya bûn. Gava bi wê teyfika ferfûrî ku qetîtkek penîrê spî yê di avê de hiştî hat, ji nişka ve ez dîtim. Bi şaşwazî navê min hilda. Min xwe ker kir. Bi bazdan hate cem min. Wekî dîna lê hat. Wê gavê kêfa min jê re hat, çawa kêfa min jê re hat. Teyfika penîr bi şaşwazî danî erdê. Bi çengê min girt û ez rakirim; da ber singa xwe û ez birim hundir, ez gêr kirim, bi avê bi pembû rûyê min paqij kir şûşt. Pirs li ser pirsê kir. Axir ez giriyam. Ew qasî pirs kir ku min hew xwe girt, min got em pev çûn.

Got, “Tu û Kubilay?”

Min got, “Na.”

Min negot bêrika Kubî bi serê min de ket. Diya min bi potikekî zer î mezin serê min girê da; berî ku girê bide jî bi bayê bezê çûbû mala Xatltîka Aliya wan pembûyekî rengîn î tûj anîbû û di serê min dabû. Ji êşa wê ez mirim lê min dengê xwe nekir. Her cara pembûyê tenturdiyotkirî di serê min dida, ber re jî bi rûyê dayikeke lixweşikandî dirêj dirêj pif dikire devera min a ku dişewitî. Di odeya ku bêhna îyotê tirş û tehl kirî de cilê li min guherandin. Dimsa hewdelî li qetek nan kiribû anî hevşiqand destê min. Min ew nanê ku li ser dimirim nexist devê xwe, min danî keviyekê. Diya min dengê xwe nekir. Paşê jî ez birim li ser cihê min dirêj kirim. Gava ser min dinixumand bi wan lêvên xwe yên nerm û têr keder daqul bû, serê min maç kir. Diya min bû; çi xweş diya min bû; min nexwest rakevim jî.

Wê gavê ez li çi fikirîm, nizanim.

Şibake vekirî bû. Bêhna xiyarên nûgihayî ku dibûn xemla maseya araqê ya li ser ferşikan tevlî bêhna leylaq û gulehungivînan dibû, digel wê êvara têr kul û keder a xilaseka nîsanê wekî potikekî şil devera ku diya min maç kirî bi lêvên xwe yên germîn ku girî dixin qirika mirov de dinixumand. Min gulpîna êşa serê xwe jî hîs nedikir êdî.

Dengê kuxika bavê min bû. Ya ez li hêviyê bûm. Wekî ku difetisim li min hat. Bêhna min dernediket. Kete guhê min ku diya min li derve tiştek jê re digot. Herhal behsa min jê re dikir.

Min ê vê êvarê pêlava bavê xwe nebiriqandana. Lê serê sibehê karê pêşî min ê ev bikira.

Ez mam li hêviyê ku qaseke din derî wê vebe, bavê min wê xuya bike, belkî jî fenanî diya min, lê cara pêşi wê nêzîkî min bibe û serê min maç bike. Ew yekî ku qet nedikenî, nedipeyivî bû, bavê min bû; ew qas sal bûn bavê min bû, lê vê carê, nekenê, nepeyivê jî, dikaribû were li serê min î birîndar î girêdayî piçekî bi çavê bavîtiyê binihêre, heta dikaribû xwe xwar bike û maç jî bike, fenanî diya min; ma çima nebe.

Ji nişka ve min bêriya wê kêlîka xwe ya di xwînê de mayî û xwe bi ser kevirê birî de berdayî de kir. Min dixwest bavê min di wî halî de ez biditama. Êdî çênedibû ku. Hema bila be, diya min ê jê re behs bike, belkî behs kiribe jî.

Ji nişka ve bi pîkêniya bavê xwe re lerizîm, hişk bûm, bûm kevir. Ez bawer im ev cara pêşî bû bavê min dikenî. Dirêj dirêj keniya. Ma bavê min bû ev zilam? Evê ku dikenî ew bû? Ma ew zilamê ku qet nedikenî, yê mad û mirûzkirî bû, evê ku dikenî? Di dilê min de, ha di vê dera min de tiştekî got 'tirk'. Min guhê xwe girtin.

Min anî bîra xwe gava bikene wê bêvila wî mezin bibe, bibe nehîtek bi wê qebîhiya wî lê fikirîm.

Ji bo pêlava wî nebiriqînim sibê ji eksa wî ez ê zû ranebim ji nav ciyan. Gava ez rabûm ew ê ji zû de çûbe ser karê xwe.

Wê şevê bavê min nehate oda min, nehate dîtina min.

Wer: B. Ronîzêr